# SIFREYA HEFT ŞÎN

**Sermijar**:
Mijara hanê yek ji mijara herî şêlû ye di navbera Kurd û farsan de. Rewşa civakî, erdnîgarî û dîrokiya Kurd bi awayekê astengeke mezin bûye li hemberî rastiya Kurd weke ku heye. Neteweyên derdorên Kurdistanê, di dirêjahiya dîrokê û ta niha, tenê dagirkerê ax û mirovên Kurd nebûne, belku talankar, dizîkar, wêrankar û jêrjorkarên çand, bawerî, dîrok, hûner, mûzîk, mîtolojî, ziman û hemû nirxên netewî yên Kurdî bûne jî. Weku me amaje da, ji ber gelek sedeman mirovên Kurd qasî ku mijûlê man û neman yan jî jiyanên rojane bûne, ew qas mijûlê kesînê nebûne(li xwe xwedî derketinê nebûne). Fars weku nêzîktirîn netew ji Kurd, çi hebûye û heye, hemû talan û tajan kiriye û ji hûrtirîn ta gûrtirîn nirxên Kurdî, çi hebin biriye û li ser navê xwe û bi xwastên xwe ewan theorize, analîze û organize kiriye. Di nivîsên berê de me çend kod, mijar û sembolan derbêj û dernivîs kirine, ya vê carê mijareke gelekî balkêş û kevnare ya Kurdî ye ku koka wê vedigere bîrûbaweriya Mîtrayî ya Kurdî û baweriya Sumeriyan li Zagros ta Toros û Mezopotamiya mezin ku ew jî “Sifreya heft Şîn”e.
**Şîn û ramanê wê di warê zimanî de**:
Berî ku em mijarê vekin, giring e, em ji raman, wate û kûrahiya “Şîn”ê fêm bikin û berê xwe bidin felsefe, bawerî û rêbaza Mîtrayî, daku em bi wayeke zelal û delal ji mijarê fêm bikin. Şîn di Kurdî de, di gelek wate û ramanan de watedar û roldar e, ez vê nivîs û mijarê weku derfetekê dibînim ku di warê wateyî û heta îtîmolojiyê de jî zend û rave bikim, ka gelo Kurd peyva “Şîn”ê ji çi re dibêje û bikartîne, gelo girêdana ewan wateyan bi hev re çi ne. Peyva “Şîn”ê di Kurdî de herî zêde di pênc wate û ramanan de şênber û roldar e ku ewan jî:
1.Şîn di wateya hebûn, zanayî û parêziyê de
2.Şîn di wateya jîn û şîn anku heşînêde
3.Şîn di wateya mezinî û teje bûnê de
4.Şîn di wateya ruh ji laş derketin û donadonê de
5.Şîn di wateya rengê şîn de
Bêguman peyva “Şîn”ê şayend di wateyên din jî roldar be, lê di ewan pênc wateyan de zêdetir şênber e.
**1.**Şîn di wateya hebûn, zanayî û parêziyê de:
Reha vê mijarê vedigere dema Sumerî û heta Misiriyên kevin jî, lê di şaxa Xûrî-

Hûriyan de weku belgeyên şênber bi taybet di peykeran de zêdetir berçav in ku çavên xwedawend yan jî zana û mezinên wan bi rengê şîn nexş û nîgar kirine û şop û bala xwedawend yan jî zana û mezinan şan dide li ser civakê û akarên mirovî yên başî û nebaşiyê de. Xwedaweda "Mirin û Jîn"ê anku xwedawenda "Vejîn"ê xwedawenda çavşîn bûye, raman rengê şîn di wateya hebûn û vejînê de, her heman xwedavenda mirin û jiyanê ye di baweriyên Kurdî yên kevnare de. Her heman çand, wate û ramanê dûre bi hin guhertin di terz û wateyên wê de kete civakên derdor û olên nû jî bi taybetî olên Îsayî, Musayî û Îslamî de bi terz û ramana şavên nezerê û parastin ji bed û xerabiyê anku hêza xwedawendî bo parastina wan ji xerabî, helbet di di Kurdî de û bi taybetî di Soranî de weku "Çawezar"ê tê gotin. Helbet di Înglîzî de "Çavê Şeytan"ê, di Erebî de "Çavê Hesûd, Nezerê Hesûd"ê, di Ewropî de "Çavê Xerab" û di Farsî de "Çavê gemar"ê tê gotin.
*Têbînî: Peyva "Çawezar"ê, Çaw her çav e, lê bp peyva "Zar"ê, bi çend curan mirov dikare lêbinêre û wê zend û rave bike. Em di zanin di zimanê Kurdîyên berê û bi taybet di Pehlewanî de peyvên "Zar, Zawer, Zohr, Zuhr, Zuhre"yên din hene ku tav tên wateya "bedewî, gewrî, sipehî"yên din ku dûre weku "zar, zara, zuhra"yê derbêj û bilêv bûye û heye ku ew jî vedigere hêz û xwedawenda "Bedewî"yê. Di wateya duyemîn de peyva "Zar"ê tê wateya "Ziman, Axaftin, Soz, Dû, Peyvîn"ê de weku "Zar û ziman"ê. Di wateya sêyemîn de "Zar" tê wateya "Girîn, Hesir rêjtin"ê weku "Girî û zar"ê. Di wateya çaremîn de "Sar" heman wateya "Sar"ê ye anku "şibih û gon"ê weku "rûxsar, kohsar, şermesar(şermezar), segsar, gurgsar, rengsar"yd..*
Heman nezer û ehrîmeniyê di zexrefe, nexş û nîgarên kevir yan jî alaveke din ku çaveke şîn e û şîneke avî û dûre rengê spî û a navîn jî renêg reş e ku her çar reng û paj in û sembolên her çar hêm in. Xelkî wê çavê şîn didin ser dîwar, xanî, dar û kincên zarokan daku parastî bin ji her nebaşiyekê. Lê giring e em kok û ramana wê ya bingehîn bizanin û fêm bikin ku ew mijar xwedî dîrokeke kûr û hûr û dûr e ku ew jî çand û baweriya Mîtrayî ye ji Sumerê re ta şaristanî û çaxên paşîn û ta îro jî ku hê rola wê mayinde ye û kara ye.
**2.**Şîn di wateya jîn û şîn anku heşînêde:
Berî ku werim ser zend û raveya wê. Em ê ji peyva "Şîn"ê re destpê bikin. Ez guman dikin ku peyvên "Şîn û Jîn"ê di kok de heman peyv bin ku ew jî vedigere ser "Zî"ya Sumerî ku dûre di Kurdiya nû de "Zî" bûye "Jî"yê û weku lêkerê bûye "Jîn" û weku îsîmê jî "Jîyan" ku bi aliyekî din li dewsa "temen yan jî umir"ê, "Jî"yê tê gotin ku her heman kok û wate ye. Di baweriya Mîtrayî de her çav hêmên hebûnî anku "As, Ar, Ax, Av"ê di darê de şênber anku şênberza û xweza dibin. Lew di baweriya Mîtrayî de ku dûre her sê dînên din ku her sê jî sê şaxên Mîtrayî ne, ew jî "Yarsanî, Zerdeştî û Êzîdî" ne, mijara Darê û şînbûnê dîsan rola wê berçav û di cih û asteke

bilind de ye ku di Mîtrayî û her sê dînên paşîn de jî jêre dibêjin “Dara Jiyanê”. Di Mîtrayî de dara jiyanê şênberzaya her çar hêm û elementên bingehîne ku ji axê şîn dibe, bi hewayî şîn dibe, bi avê şîn dibe û bi agirê disoje anku her çar hêm di xwe de şênber û raman dike û di giyan û jiyanê de xwe dide şan dan.

*Têbînî: Ez guman dikim ku peyvên “Jiyan û Giyan”ê her yek peyv û wate bin û her weha peyva “Giya”yê jî her di heman peyv û wateyê de be ku tevan vedigerin ser peyva “Zî”ya Sumerî anku Jîn û Jîyan, Zînde û Giyan, Şîn, Heşîn û Giyayê de*

Ji aliyeke dî raman û kûrahiya wateya darê di felsefe û baweriya Mîtrayî de di ramana “Qûrbanî kirinê” de balkêş e û em dibînin, bi taybet di cejn û şeva Mîtrayî anku Yekdayê de ku cejn û şeva jidayikbûn û vejînê ye. Di wir de qûrbanî kirin çandina darê ye bi taybetî dara Kaj û Berûyê ku dû re wê mijarê ketiye dewrana Sumeriyan de bi taybetî di dastana “Gelgamêş”ê ji wê darê re “Sarîd”ê tê gotin û de Babîliyan, Asuriyan, Xiristiyan û gelek dewran, netewe û memleketên din de jî. Çandina darê û qûrbanî kirina darê weku dara hebûnê û şênberzaya her çar hêman anku dara Jiyanê di cejn û şeva Mîtrayê anku Yeldayê de, di sersala Xiristiyaniyan de tê pêşberê me ku dara Kajê bi rengên cur bi cur dixemlînin û weku dara vejîn û jiyanê de didin şan.

**3.**Şîn di wateya mezinî û teje bûnê de:

Şîn-e di wateya mezinhaiyê de zêdetir di zarê Soranî de maye ku tiştek ji pîv û hedê xwe meizntir be, peyva “Şîn”ê tê bikaranîn weku dibêjin: şînemirov, şîneçiya, şînedar, şîneberd yd.. ku ew jî vedigere ser heman mezinahî û xwedawendên bala.

**4.**Şîn di wateya ruh ji laş derketin û donadonê de:

Di zimanê Kurdî-Pehlewanî de jî wate û peyva “Şîn”ê her “Şîn”e. Helbet hin caran jî weku “Şîwen”ê jî hatiye. Lê berî ku em werin ser wateya wê, giring û pêwîst e em raman û kûrahiya wê di bawerî û çanda Kurdî de bibînin. Di Felsefe û baweriya Mîtrayî de “Donadon”ê heye anku mirov dema dimire, ruhê wê ji laşî derdikeve û diçe laşeke nû, heman bawerî niha di dînê Yarsanî de maye û helbet dema bawerî û felsefeya Mîtrayî ji Zagros û Kurdistanê re digihîje Hîndistanê û Çîn û Japonê, li Veda û Bûda diafirîne, Bûda li ser heman felsefe û baweriya Mîtrayî ku dîn û baweriya xwe diafirîne û ava dike, mijara “Donadon”ê jî weku bicih dike di dînê Bûdayiyê de. Giring e em tiştekê hûr û baş fêm bikin ku felsefe, bawerî û dînê Mîtrayî li ser zagona “Vejîn”ê ava bûye anku hemû vedigerin ser “Zî”yê û “Jîn, Jiyan, Giyan û Vejîn”ê di donadonê de. Heman felsefe û baweriya Donadonê di dînê Êzîdî de jî weku “Kiras vegihertin yan jî Kinc Veguhertin”ê şênber e di heman mijara Donadonê de. Di vir de em digihîjin mijara xwe ku ew jî dema kesek weku

laş dimire, kes û nas şînê bo wê/wî dikin, ew “şîna donadonê” ye û şîna vejînê ye, bo zêdetir şênber kirina vê mijarê em dibînin heta îro jî bi taybet di zarê Soranî de ji çandina darê û binaxkirina miriyê jî, lêkera “Naştin, Nêjîn”ê tê bikaranîn weku dibêje: *wê darê binêjre, wê miriyê binêje yan jî me dara xwe naşt, me miriya xwe naşt.* Bikaranîna lêkera “Naştin yan Nêjîn”ê tenê ji bo dar û mirî tê bikaranîn ku ramana her du jî vejînê ye.

*Têbînî: Di nava Kurdên Yarsanî yên ku li bakurê welat dijîn û weku Elewî jî tên binavkirin, di nava ewan de jî mijara don yan jî donadonê cihekî diyar digire*

**5.**Şîn di wateya rengê şîn de:

Rengê şîn ji kevin re di çand û baweriyên Kurdî de xwedî pîvan û roleke diyar e. Di baweriya Mîtrayî de her du rengên “Pîroze û Şîn”ê ji her rengên din zêdetir watewer in, wate û ramana peyva “Şîn”ê di her çar zend û raveyên berê di rengê şîn de şênber û derşan dibin ku vê mijarê me ber bi bawerî û jiyara Sumeriyan dibe ew jî mijara “Av”ê ye. Di Sumerî û baweriya Sumeriyan de av afirîner û hebûna her hebûnekê ye û navê avê jî weku “A”yê binav kirine anku her tişt ji “A”yê û destpêkê re tê. Ji as û asimanê re jî “An”ê gotine ku her du jî rengên “Şîn”ê ne û hêma “Zî, Jî, Jîn, Jiyan, Giyan û Vejîn”ê ne. Hetanî îro jî peyvên ku ramana bûn, jîn û vejînê ne anku ji dayikê bûn û peyda bûnê ne bi “Av”ê destpê dikin di Kurdî ya nihayî de weku “Avad, Avah, Ava, Avedanî, To-Av=Tov, Avrandin, Aves, Avis”yd.. Xencê wê rengê şîn heta îro jî em li kêleka rengê “Pîrpze”yê di pencer û deriyên Hewramanê û kela Hewlêrê û kelên Bakurê Kurdistanê de jî dibînin. Di nivîsa berê de min li ser rengê “Pîroze”yê nivîsand û di nivîsa dîtir de ez ê li ser rengê “Şîn”ê binivîsim bi dirêjahî, lew niha zêdetir li ser mijara rengê şînê naçim û yên mayî bimîne bo wê.

**Kurd û girêdana baweriyên wî di navbera Asiman û zemînê de**:

Kurd heta navê neteweyekê be, zêdetir navê erdnîgariyeke mezin e ku Zagors û Toros û berjêra wan jî Mezopotamiya mezin e. Piştî qonaxa Holosînê û qonaxa Newlotîkê ku xwe dighîne 12 bo 14 hezar salan berê niha û ew guhertina mirovahiyê li ser asta hemû cîhanê bi ked û mejiyên kom mirovên Zagros ta Toros û Mezopotamiya mezin ku niha ji wan re Kurd tê gotin hatiye bûn û afirandinê ku ew jî bi şoreşa Çandiniyê destpê dike. Gundê “Bêstansor”ê li deşta Şehrezûrê û gundê “Zeviya Çemê”yê li binê çiyayê Birasdostê û nêzî şikefta Şanederê li devera Barzanê ku kevintirîn şûnên cîhanê ne çandinî lê hatine kirin guhertina qonaxa mirovahiyê piştî Holosînê li Kurdsitanê çêbûye li gor zanista arkolojî û

şûnwarnasiyên cîhanî. Anku qonaxa nû ya mirovahiyê li ser destê Kurd çêbûye û avabûye ku nola Newlotîkê tê derbêj kirin. Bêguman destpêka qonaxa nû ya mirovahiyê û şaristaniya Sumerî û felsefe û baweriya Mîtrayî şehadet û gevahiya wê yekê didin ku li ser vî erdî ku Kurdistana meizn e bi sedan çand, bawerî, dîn, tevgerên jiyanê çêbûne û avabûne ku piraniya wan heta îro jî mayinde û jînde ne û em bi wan re dijîn. Lew di warê felsefe û zanistên "Stêrnas(estorlojî), seqanasî, zemînnasî, tuxumnasî"yd.. de pêşneg û pêşkar e. Bi awayekî dî, Kurd xwedî peywendiyeke xurt û kûr bûye di navbera zemînê û gerdûnê de. Her wê kûrahî weha kiriye ku Kurd giringiyeke mezin bide rewş û bûyerên zemînî û felekî. Her cejn, bone, çand û baweriyên xwe li gor yan jî girêdayî tevgerên jiyanê kiriye weku cejnên Çarşema Sor, Yelda û Newrozê ku tevan girêdayî tevgerên hewayî û zemînê ne û tevger û baweriyên xwe jî girêdayî wê yekê kiriye ku, yek ji wan jî sirût û adaba Newroz û heft şînê ye.

**Giringiya hejmara 7 di dîn, çand û baweriya Kurdan de**:

Hjemara 7 di baweriya Mîtrayî de û her weha di "Yarsanî, Zerdeştî û Êzîdî" de jî hejmareke pîroz û giring bûye. Di Mîtrayî de 7 çînên asiman, 7 hêzên hêmanî, 7 carên pazdan bi ser agirî, 7 sêtrên asiman, 7 pilendên rêberên Mîtrayî ku a heftemîn a herî mezin bûye. Yd.. Her weha di dînê Zerdeştî de jî weku 7 Emşaspend, heftan heft kerişver yan heft kîşverên ku ahûremezda(xweda) ji bo cara yekemîn ew saz kirin, di Avêstayê de weku "Heptokerşiver"ê hatiye nivîsîn û gotin. Di baweriya kevn a Kurdî de serzemîn 33 paj in, paşî stêrka "Tîşter"ê ku stêrka baranê ye, barana ferr û pirr baranidye û serzemîn bûye 7 pajan ku paja navîn ji hemûyan mezintir e û bi vî hawî "1.Xivenîrete: Navîn 2.Erêzehî: Rojava 3.Sevehî: Rojhilat 4.Fire Defşû: Rojhilata jêrîn 5.Vîde Defşû: Rojavaya jêrîn 6.Vewro Beriştî: Rojhilata jorîn 7.Vewro Ceriştî: Rojavaya jorîn" in anku ew her heft paj in ku xwedawend li serzemînê afirandin

*Têbînî: 1.Xencê wê peyva "Heftad"ê anku "Heftê 70" û peyva "Hefta"yê jî anku "hefte"ya heft rojên çar hefteyên mehê 2.Di Avestayê de "Gahinbar"ê heye mebest ew e Xwedayê mezin di 6 rojan de dunya afirand*

Her heman pîrozî û taybetya hejmara 7ê di çand, bawerî û rewşa netewe û baweriyên derdore jî bi taybetî di dînên Îbrahîmî de cih digire û şênber dibe

**Sifreya 7 şîn di nava Kurdan de**:

Sifreya heft şîn ku di farsî de weku "sifreya heft sîn"ê tê gotin û heye, di destpêka

sersala Kurdî û Newrozê de sifreyek tê xemladin ku heft curên tişt li ser wê hene. Helbet divê me ji bîr nekin ku di her sê cejnên Kurdî yên “Çarşema sor, Yelda û Newroz”ê de sifre tê xemladin ku di çarşema sor de weku “Hêkerengîne û xemlên bharê” û di Yeldayê de ji wê sifreyê re “Meyzed”ê tê gotin û di Newrozê de sifreya “Heft şîn”ê tê gotin.
Kurd herdem ligel hatina sersala Kurdî û cejna Newrozê de, “Gîya, heşîna gîya genim, gula Nergizê, Ax, Av, Agir yan jî mûm û çira, pelên darê weku sembola hatina buharê û bayê pojîn û pişkûvînê” hemîşe di nava Kurdan de şênber bûne heta di stran, helbest û vegotinan de jî. Helbet çar hêmên ku baweriya Mîtrayî li ser wê ava bûye di her warên çandî û baweriya Kurdî de reng vedane.
*Têbînî: di nava farsan de niha sifreyek dixemlînin bi heft xwarin ku “S”ê destpê dikin ewan jî “Sirke, Simaq, Semenî, Sencû, Sêv û Sîr” in û her weha sevze, mûm, neynik, nanê pehn, tiyanek av, şîrînî, şîr û hin hêkên rengîne, masî di nav de û pirtûka Quranê yan jî pirtûka şaîrekê jî lê zêdebar dikin. Lê em dibînin ti yek ji wan xwarinan girêdayî hev nîn in û her weha girêdayî destpêka demsala buhar û Newrozê jî nîn in û mirov bi sadetirîn raman dibîne ev tişteke çêkiriye û bingeha wê ne durust e.*
Em di zar-zimanê farsî de peyva “şîn”ê tune ye û di ti cihekê de watedar nîne lêbelê yek ji kevintirîn û giringtirîn belgeyê li ser sifireya heft şîn yan heft sînê, pirtûka Abdûlrehmanî Bîrûnî ye ku bi zimanê erebî nivîsandiye bi navê “آثار الباقيه – AѲar El-baqiye”yê ye, dibêje: Piştî ku Cemşîd bi ser Ehrîmenî de serket ku asteng bû li hemberî xêr, bereket û barîna baranê û şîn û heşînê, dîsan baran barî û dar û gîya şîn bûn û poj û çiqil dan, xelkê wê rojê weku “Roja Nû” dîtin û her kes di wê rojê de miştek ceh çand û xelkî di roja Newrozê de di heft cam de heft curên danikan diçandin. Şayend A.Bîrûnî vê rastî û heqîqeta heft şînê nizanibe. Tiştê ku taybet e di jiyan û jiyara Kurd de, Kurd hemû cejn, bone û rojên xwe bend û girêdayî xweza û rewşa jiyanê kiriye, sifireya heft şîn ku niha bi awayê neteweya serdest ku fars e tê pîroz kirin di nava Kurdên bi taybetî Rojhilatê de, niha di nava sê aliyên din ên Kurdsitanê nemaye û hebe jî kêm e, lê weku çawa di cejna Mêhr û Yeldayê de sifireya “Meyzed”ê heye, sifireya “Heft şîn”ê jî weku pêşwazî kirin ji heşîn û vejîna serzemîn û jiyanê, dikare careke dî weku çawa piştî zêdetir ji hezar sal ji dagirkarî, talanî û bindestiyê “Sembola tavê, Newroz, Yelda, Çarşema Sor, Tenbûr, Henar, Mar, Şahmaran” yd… Her weha xwedî derketin ji nirx û nasnameya Zagros, Toros û Mezopotamiyayê yd… xwedî derketiye û roj bi roj rastî û malmulkiyên wan têne rave û rastiya wan têne derxistin û şîkar kirin, sifireya “Heft Şîn”ê jî bi reng û bêhna Kurdewarî û heqîqeta wê weku heye, careke dî bihête vejîn û şîn kirin.

*Têbînî: Cejna Newrozê mezintir e ji efsaneyeke bi navê Kawa û Dehak. Cejna Newrozê girêdayî vejîna zemîn, rewşa Hewayê û salnameyê ye ku di mîtolojiya Sumerî de vejîna "Dem-Muz"ê ye di 21..3 bi sala mîladî, di heman demê de sersala nû ya salnameya Sumerî ye jî bi navê cejna "Zegmak yan Zekmûk"ê ku ta niha jî Kurd ji bo hatine bûn û zade bûnê "Zikmak"ê bêje dike.*

Lêkolîn û Nivîs: Qendîl Şeyxbizînî